Nizamettin Ariç - Êş (2015)
Nivîser:Nezîr Palo
Awazçêker:Nîzamettîn Arîç
Hejmar:9

Êşa Rojava

[Nîzamettîn]
Çûme Çiyayê Kurmênc, li nav gerîm
Efrîn mîna bûkan, bi xemla zêrîn
Min dît Efrîn bi ser xwe de dilorîn
Jê pirsiyam, hêstir ji çavan barîn
Bersiv sar bû li ser lêvên wê şêrîn
.
[Mizgîn]
Xort, keçen min ji bo welat cangorî
Ji Başûr ji Bakur venegerîn
Talan dibin dikin hawar û qerîn
Dil û cîgera min ji sînga min çirîn
Heywax li min heywax, heywax li min
Heywax li min çawa welat tê dizîn!
Heywax li min heywax, heywax li min
Heywax li min çawa welat tê dizîn!
.
[Nîzamettîn]
Berê xwe min da çolê wê beriyê
Bûm mîvanê bajarê Kobaniyê
Min dît keçek digiriya li wê bejiyê
Bi dilsotî pirsiyam ji wê horiyê
Heywax li min heywax, heywax li min
Bi dilsotî pirsiyam ji wê horiyê
Heywax li min heywax, heywax li min
.
[Mizgîn]
Xwîna birayê min rijiya li vê goriyê
Yarê min kuştin leşkerên suriyê
Herdu mirin bo eşqa azadiyê
Sonda min ji ku bigihe ronahiyê
Heywax li min heywax, heywax li min
Heywax li min ji vê zilm û zoriyê
.
[Nîzamettîn]
Ez çûme serdana Girê Şermola
Hat qîrîna zarok û mindalan
Pirsiyam ji sînemayê, ji dîwaran
Ji Amûdê hîn tê dengê hewaran
Heywax li min heywax, heywax li min
Ji Amûdê hîn tê dengê hewaran
Heywax li min ji nalîna şûnwaran
.
[Nîzamettîn]
Min berê xwe da bajarê evînê
Min dît Qamişloka'm di nava şînê
Şêxê şehîdan Mişel bi bîr tînê
Navê Mişel şehîd dinivîsînê
Navê Mişel Temo dinivîsînê

Heywax li min heywax ji vê lehiya xwînê
.
[Pêkve]
Dirbasiyê çara xwe lê nabînê
Dêrika Hemko rondikan dibarînê
Serê Kaniyê êşa xwe dilorînê
Kurd li Şamê dest danî ser birînê
Heywax limin heywax, heywax li min
Heywax li min ji wê lehiya xwînê.

https://hunerakurdi.com/gotin/nizamettin-ariç/êş-2015/êşa-rojava/

Nivîser: Amedo 12-06-2015
Guhertina dawî di: 26-08-2015